# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (308):

## Hevkariyên/te'awîniyatên" Turkî buhayeke nizim ji zêtê zeytûna re didin ferzkirin, "Ebo Emşe" di vêrgî û dizînên werza/mûsima zeytûna de yê yekê ye, girtin û geregoşî û gizgizî

Ji bilî bace û vêrgiyên diravî û şênberî yên mezin ên ku Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" li ser werza zeytûna li Efrînê daye ferzkirin, û bi zorê û gefan û hêza çekan tê wergirtin, vêrgiya payandinê (xalên çavdêriyê, giropên gerokiyê) -yên ku serkêşên milîseyan dibêjin ku ji bo parastina malmewdanan hatine danîn- hate ferzkirin! Lê bûyînên hene diyar kirin ku ew ji bo çavdêrîkirina karên xelkê Efrînê di werzê de bûn, û weha jî ji bo neçarkirina xelkê ku berê xwe bidin guvêşgehên zeytûna yên di çarçewa wan de, wergirtina vêrgiyên şênberî bi rengekî yekser, û peçinadina li ser dizên çekdar ji endamên milîseyan û malbatên wan û yên ji wan ve nêzîk; Dizîn nesekinîne û ta niha berdewam in, û mezintir û feretirî salên borî bûn, û bê ku xwediyên zeytûna kanibin li dijî dizan bisekinin an giliyekî li ba Destlatên Dagîrkeriyê yên ewlehî û dadgeriyê vekin, û ew ditirsin vêrgiyên li ser wan ferzkirî red bikin, bi ser de jî ew hin caran neçar dibin -ji bo ku bidin- hin tiştên xwe bifroşin, da ku bêtir rastî binpêkirinan netên.

**Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Werza zeytûna:**

Nov 4, 2024

ağı borsaları göz önünde bulundurularak, bölgede fiyatlarında güncelleme yapılmıştır.

BÖLGE ZEYTİNYAĞI TENEKE ALIŞ FİYATLA

| | ALIŞ |
|---|---|
| Zeytinyağı Asidi | $ |
| 0,10 – 0,49 | 57,0 |
| 0,50 – 0,77 | 56,0 |
| 0,78 - 1,45 | 54,5 |
| 1,46 - 1,95 | 52,5 |
| 1,96 - 2,95 | 51,0 |
| 2,96 - 4,90 | 49,0 |
| 4,91 - 7,90 | 47,0 |
| 7,91 - 12,00 | 45,0 |
| 12,01-20,00 | 42,5 |

غرفة زراعة منطقة غصن الزيتون

تاريخ : ٢٥/ ٠٩/ ٢٠٢٢ قرار رقم (٥٥)

بناءً على مقتضيات المصلحة العامة و لحسن سير العمل .

تقرر ما يلي :

١- على كافة تجار الزيت في منطقة غصن الزيتون الحصول على (رخصة تاجر) من غرفة زراعة غصن الزيتون لتسليم زيت الزيتون لشركة (TARIM KREDİ) .

٢-تحديد رسوم الحصول على رخصة تاجر لعام ٢٠٢٢ بمبلغ /٣٥٠/ $ ثلاث مئة و خمسون دولار امريكي .

رئيس غرفة زراعة غصن الزيتون

نسخة إلى :

المجالس المحلية

المكاتب الزراعية الفرعية

الشعب العام

قيادة الشرطة المدنية

Ji ber kêmbûna derxistina zêtê zeytûna ji herêmên desteserkirina Turkiyê li Bakur bo hundir Sûriyê û bilindbûna lêçûnên wê, û dorpêçkirina derxistina zêtê tenê di riya Turkiyê re, bi riya "**Hevkariyên Gerantiya Çandiniyê yên Turkî/Te'awiniyat El'itîman El'zîra'î El'turkî - TARIM KREDI**" ya ku bazarê kontirol dike, wêlomê nirxa zêtê ji dora /100/Dolar Emrîkî ji her tenekekî re (16 KG sade) daket kêmtirî /60/Dolarî bi destpêka werza îsal re, û komela (TARIM KREDI) ya ku navenda wê ya serekîn li Taxa Rif'etiyê - Bajarê Cindirêsê lîstak bi buhayên zêtê di navbera /42.5 - 57/Dolaran de ji her tenekekî re derxist, yanê kêmtirî nîvî buhaya cîhanî ya heye (ya ku digihêje bêtirî /130/Dolarî her tenekekî re), bi ser ku pirbûna daxwaza navdewletî li ser zêtê zeytûna, û bi vê yekê Turkiyê rewşên serwerkirî li Sûriyê û wan merc û heyamên ku ew ferz dike diçewsîne

û fêdê jê dibîne da ku zêtê zeytûna yê Sûrî bi buhayên herî nizim bikire û li derve weke behemdaneke Turkî bide belavkirin, weke piroseyeke dizînê ye salixdankirî û rêbazkirî.

Û hin caran di rewşên neçariyê de yan jî ji bo dandina baceyan, û di hundir guvêşgehên ku ji aliyê milîseyan dorpêçkirî de, nemaze jî di çarçoveya "Tîpa/Firqeya El'sultan Silêman Şah" de, her tenekek zêtê bi /35/Dolaran ji xwediyan ve tê firotan.

Û were bîranîn jî ku "Odeya Çandiniya Herêma Şaxa Zeytûnê" biryarek bi nimreya /55/ li 25.09.2022an. Z derxist, têde bazirganên zêtê bi wergirtina (rêdanka/ruxseta bazirganiyê) bi wêneyeke salane /350/Dolar Emrîkî û radestkirina zêtê jî bo (TARIM KREDI) pabend dike.

**Ev jî hin ji binpêkirinan e:**

**■ Vêrgiyên "Ebo Emşe":**

Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah" ên ku "**Mihemed El'casêm/Ebo Emşe**" serkêşiya wan dike, karên talankirina werza zeytûna bi zorê çekan berdewam dike. Jê emê van bi bîr wînin:

**-** Piştî riswakirina perçiqandina xwepêşandana jinan li Gundê "**Kaxirê**" - Navça Mabeta li 15.09.2024an. Z, wê milîseyê vêrgiyên ferzkirî li ser her dareke zeytûnê di nav zeviyên ên ne li wir de ji /8/Dolaran daxist /6/an, û hemwelatî neçar kirin ku li ser sozên dandinê îmze bikin; Û di rojên dawiyê de, aliyatên (tirektor û makîne) yên nikanin bidin di biryargehên xwe de û herweha jî zêtên zeytûna di guvêşgehan de bend kirin, û ji ber wê jî temenmezina bi tenê rûniştî "**Helîme Hemreşo** /80/sal" neçar bû ji gund bo Bajarê Heleb penber bibe, ji ber ku nikanî vêrgiya /7/hezar Dolar a li ser zeytûnên zaroyên wê li derve ferzkirî bida, û "El'emşat" jî dest danî ser mal û hemî malmewdanên wê; Û ji ber ku dahatiyên werza pirekan têra dandina vêrgiyan nake, vêca ew neçar dibin ji bo dandinê hin tiştên xwe bifroşin.

Û weha jî dest danî ser tevahiya werza /400/darî hemwelatiyên ne li wir "Isma'îl Hesen" û birayên wî, û bê ku lêçûnên du salan bide, yên ku Dilovanber "Şêx Mihemed Ebdo Ebo" pêşkêş dikir, ewê ku li 05.09.2024an. Z bi seknexwîna mejî ya ji qehra re miriye, di encama zextên li dijî wî hatine bikaranîn, ji bo valakirina mala "Isma'îl ya ku malbata wî têde rûdinişt".

**-** Ji berî heftakê, li nav Gundê "**Senarê**" - Navça Şiyê, û li pêş xelkê Hemwelatî "**Ebdo Kemal Kinê** /46/sal" kêmrûmet kir û mekin lêxist, ji ber ku wî nikanî vêrgiya zeytûna ya li ser ferzkirî /20/hezar Dolar Emrîkî bida, bi ser ku wî makîne û tirektora xwe ya çandiniyê radestî biryargeha "El'emşat" kir, da ku kanibe ji şerê wê rizgar bibe.

**-** Firotina zêtê ku di çarçoveya xwe û di hejmarek bêlîkirî ji bazirganan de dorpêç dike, û her yekî ji wan bi dandina/10/hezar Dolar Emrîkî pabend dike, beramberî kirîna wî ji zêtê re; Û li Navça Şiyê tenê şeş bazirgan "**Mistefa Dawod, Hisên Xelîl Şêxo, Ehmed Cemîl Şêxo, Mistefa Horîk, Kamîran Ibrahîm Remedan**" hene.

**-** "Sêf El'casêm" birayê "Ebo Emşe" rêdankerên/wekîlên hemwelatiyên ne li wir li hersê Gundên "Çeqela" li Navça Şiyê neçar dike ku berhema zeviyên xwe li Guvêşgeha "Rif'etê Beco" biguvêşin, bermaberî wergirtina wî 30% ji para guvêşgehê, û dema ku van hemwelatiyan "**Mihemed Ukaş Dawod, Ezet Mistefa Hebeş, Mistefa Mihemed Hebeş, Mistefa Reşîd Mehmûd**" bi sedema pabendbûna wan bi guvêşgehine din re, redkirin û neçûn guvêşgeha "Rif'et", û "Ebo Umer El'xalidî" û endamên xwe ji giropa "El'emşat" ew anîn û bi rengekî mekin li wan xistin.

**-** Ji berî du rojan, bi riya perçedengên "Wats Apê", keyayê Gundê "**Hisê/Mîrkan**" - Navça Mabeta li ser zimanê "El'emşat" hemwelatiyên vêrgî û baceyên li ser wan ferzkirî nedane bi zimanekî sert agahdar kirin, ku bi lez li nivîsgeha "Ebo Welîd" a li meydana gund vegerin û tiştê ji wan bê xwestin bidin.

■ Li Bajaroka **Meydankê**, ya ku Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad, Artêşa/ceyş El'nuxbe, Feyleq El'şam, Firqit El'mu'itesêm, Rîcal El'herb/Mêrên Cengê", piroseyin fere yen dizînê çêbûn, nemaze jî bişûnxistina rêdana berefkirina piraniya zeviyên zeytûna bi behaneyên têvel, hîşt ku fersendeke dirêj ji dizîna zeytûna û dizan re çêbibe, û mirov kane bibêje ku werz bi dawî hat, û vêrgiyeke bi rêjeya 50% li ser berhema zeviyên yên ne li wir û 10% li ser berhemdana zeviyên ên li wir ji xelkê bajarokê hate ferzkirin.

■ Li herdu Gundên "**Keferzîtê, Tilifê**" - Başûr Rojvayê Bajarê Efrînê, Milîseyên "Firqit El'hemzat" /30/Dolar Emrîkî li ser her dareke girtî ji malmewdanên hemwelatiyên ne li wir û ne desteserkirî didin ferzkirin, û weha

jî /2/Dolaran li ser her dareke girtî û /0.5/Dolarî jî li ser her dareke negirtî ji malmewdanên ên li wir, ji bilî yên desteserkirî yên hemwelatiyên ne li wir; Û ji bo rêdana vedana daran /2/ kaxez/lîreya Turk li ser her darekê ferz dikin.

Herweha jî şedak karkir ji "El'hemzat" di rojeke tenê de /105/çiwal zeytûn (her yek dora /90/KG) ji zeviyên birayên hevjîna mamoste "**Cum'e Hemo**" ji xelkê Gundê "Keferzîtê" (û yên ku wî bi rêdankê/wekaletê bi rêve dibirin) li ber çavê xelkê beref kirin û dizîn.

■ Li Bajaroka "**Kefirsefrê**", Milîseyên "Lîwa'i El'weqas" /150/hezar Dolar Emrîkî li ser xwediyên dora /200/meştelên zeytûna ji xelkê wê ferz dikin, /1500/Dolar li ser her meştelek ku /50/hezar şitil guncaw dike û /500/Dolar jî li ser meştelên ku şitlên wê kêmtir bin; Û herweha jî /2/Dolaran li ser her dareke zeytûnê ye deştê û /1/Dolarê jî li ser her dareke çiyayî, rewşa wê çawa dibe bila be, bi ser ve jî tibabeke pereyên Turk beremberî dandina kaxeza rêdana berefkirina zeytûna ji her zeviyekê.

■ Li 07.11.2024an. Z, "**Wesîm**" ê ji Gundê "Me'erit Herme li Parêzgeha Idlibê" û berpirsiyarê "Nivîsgeha Abortiya Milîseyên Firqit El'hemzat" ji keyayên gundine girêdayî Navça Reco re -ji nav wan jî Gundê "**Hecxelîl**"- perçedengin şandin, û wan bi zimanekî gefdarîkirinê agahdar dike, ku gerek xwediyên zeviyên zeytûna bilezînin vêrgiyên xwe bidin, û herweha jî gerek ew nivîsgehê bi navên ku nadin agahdar bikin.

■ Li Gundê "**Maseka**" - Navça Reco, "**Ebo Heyat**" ji "Qelemonê" - Gundewarê Şamê, yek ji Milîseyên "Tîpa/Firqeya Nehan" û di maleke serdestkirî de rûniştî, bi hevaltiya çekdarin din, radibe li nav zeviyên zeytûna digere, û di navbera /0.5 - 5/çiwal zeytûn yekser ji xwe re li ser xwediyan ferz dike, eva ji bilî vêrgiyên ku "Firqê Nehan" ferz dike.

■ Li Navça Bilbilê, "**Ednan El'xuweylêd/Ebo Welîd El'ize** - berpirsiyarê abortiya Milîseyên Firqit El'sultan Mûrad" rabû Hemwelatiyên Gundên "**Kotana, Qirigolê, Bîbaka, Xelîlaka, Qota, Kerê, Eşûnê, Zivingê, beşekî ji Gundê Dîkê**" neçar kirin, ku daxuyanên malmewdaniyê yên tomarxaneya malmewdaniya Helebê peyda bikin, da ku malmewdanên xwe biçespînin, ji ber wê piraniya wan bi çetinahî peyda kirin, û yên mayîn jî vêrgiyên vazle dan; Herweha jî ji bo berefkirinê sozek ji her gundekî re danî, ta ku hin jê dereng man, û zeviyên wan jî rastî dizînên zêdetir hatin.

■ Li Gundê "**Satiya**" - Navça Cindirêsê, şedak ji çekdarên Milîseyên "Firqit El'hemzat" rabû tevahiya berhema/500/darî zeytûnê (yên koçberê zorane "Ristem Ehmed" û birayên wî) beref kirin û dizî, bê ku guh bide lêçûnên xizmetguzariya çandiniyê yên du salan, bi behaneya ku ew ne li wir in, bi ser ku ew dar bi riya birayekî wan yî li gund dihatin rêvebirin.

■ Rêbendên Milîseya "Asayêşa Leşkerî li Navça Reco" ya ku berpirsiyarê wê "**Ebo Hesen** - ê ji Der'a û endam li ba Firqit El'hemzat", vêrgiyên bi navê baxşîşan li ser her çiwalekî zeytûna yan tenekek zêtê zeytûna yên di cem rêbendên wê re derbas dibin dide ferzkirin; Divê bê zanîn ku ew rêbend girêdayî "Şaxa Asayêşa Leşkerî li Bilbilê" ne, ya ku "Ebo Ezîz" serkêşiya wê dike.



**= Girtinine bêsûcane:**

**-** Li Êvara 01.11.2024an. Z, li Bajarê Entabê yê ku ew û tevî malbata xwe ji çend salan ve lê rûdiniştin, û li ser riya vegerê ji vejînkirina dewatekê bo mala xwe, amûrên ewlekariya Turkiyê Hunermend "**Henan Mihemed Sinî** /50/sal" ji xelkê Bajaroka "Be'idîna" - Navça Reco girt, bi behaneya hebûna kêşeyekê di nasnama rûniştina wî de, û ta niha li wir girtiye, û malbata wî ditirse ku wî zorane bo Sûriyê bidin derkirin.

**-** Li 06.11.2024an. Z, Milîseya "Asayêşa Leşkerî li Bilbilê" herdu hemwelatî "**Welîd Mihemed Nûrî Keyalî** /42/sal, **Idrîs Nûrî Osman** /40/sal" - xelkê Bajaroka Meydankê girtin, bê ku sedem werin xuyakirin, û berê jî carekê "Keyalî" bi tuhmeta/tewanbariya têkildariyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re hatibû girtin.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

**-** Li 04.11.2024an. Z, li pêş "Xwaringeha Kebso" li orta Bajarê Efrînê, çekdarekî di Makînek Cîp e Santafê de, qurşîn avêtin "**Silêman Ezedîn** /37/sal - ji Gundê El'betrane - Navça Til El'deman/Gundewarê Heleb ê Başûr", ew bi kûranî birîndar kir û reviya; Û li gor jêderine ragîhandinî yen xwecihî ew bûyer bi sedema dozeke tolhildanê ye kevin e.

**-** Li Êvara 13.11.2024an. Z, li Bajarê Efrînê, seferbîriyeke leşkerî û tewatîrek di navbera girseyine ji çekdarên Gundewarê "Şamê" û hine din ji herdu Bajarokên "Heyanê û Biyanûnê" yên hevcîwar - Bakurê Heleb de çêbûn, û qurşîn bi jor ve hatin avêtin, sekvan derketin ser banên avahiyan, û hin avêjtek li nav sivîlan ketin; Û ew jî bi sedema dijayetiyekê li ser jineke ji "Şamê" bû, ye ku ji bo dermankirine rakirine nexweşxanakê.

**-** Li 15.11.2024an. Z, girseyin ji çekdarên Êla El'mewalî ketin seferberiyê, piştî kuştina zarokeke /8/salî -keça malbateke wê- bi qurşîna ku ji aliyê endamên rêbendeke Milîseyên "Firqit El'sultan Mihemed El'fatêh" ve li Efrînê, li dema pevçûnekê bi giropeke çekdar e nediyar re, ye ku di makîneyek Van de, ye ku çiwalin zeytûna dizînê têde, û rêbend derbas kiriye bê ku bisekine; Bê zanîn jî ku zaroka mirî di koneke nêzîk ciyê bûyerê de rûniştibû.

**Hemî bûyerên ku di werza zeytûna ya îsal de bûne û dibin (ewên ku tiştê hevbeş di navbera milîseyên têvel de, bi zorê çekan ferzkirina vêrgiyên bilind li ser e, û talankirina tibabeke herî bilind ji dahatên wê ye), bi rengekî aşkere diyar dike, ku siyaseteke dijmaneyatî ye rêbazkirî li dijî xelkê herêmê, hewildana belangazkirina wan, û têvedana wan bi aliyê koçberkirina zorane ve, bi rêberkirin û serpereştiya yekser ji Istîxbatatên Turkiyê ve tê meşandin.**

16.11.2024. Z – 2636. K

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Lîstak bi buhayên zêtê zeytûna li Efrînê, ya ku ji "Hevkariyên Gerantiya Çandiniyê ya Turkî/Te'awiyat El'itîman El'zîra'î El'turkî" li Cindirêsê derhatî.

- Biryara "Odeya Çandiniya Herêma Şaxa Zeytûnê" nimre/55/, dîrok 25.09.2022. Z, a taybet bi pabendkirina rêdankirina/ruxsetkirina bazirganên zêtê.

- Rêbenda Milîseyên "Asayêşa Leşkerî" li derbsgeha Başur ji Bajaroka Reco, û herdu kesên bi "Ebo Hesen" û "Ebo Ezîz" têne navdan.